

## Piştgiriya ziman li dibistanê

Di dema dibistana sertayî û di şûn de jî piştgiriya zaroka we di hêla zimanî de tê kirin.

Eger zanîna zimanê almanî têr neke:

- Polên piştgiriyê dikarin bên avakirin, ev sinif wê amadekariyê ji bo serdana polên fermî bikin.
- Kursên piştgiriyê „almanî wek zimanê duyemîn“ (6-8 seet di heftiyê de), yan dersdana piştgir ya zêde (4-5 di heftiyê de) tîn pêşkêşkirin.
- Di hîna dibistanan de destekên piştgiriyê yê taybet hene mîna hînkirina Alfabê, dersdana li kêlekê uhd.

Ji bo vê, seetên hînkirinê yê zêde ji bo bi destxistinê amade ne.

Xwendevanên ku pêdiviya wan bi piştgiriya perwerdiyêk taybet heye, li dibistanên taybet yan jî yê giştî dikarin dersê bistînin.

Dawîkirinek serkeftî ya dibistanê rê li pêşiya pîşe (meslek) vedike.

## Hîn pirsên we hene?

Agahdariyên zêde hun dikarin ji van cihan bigirin:

- ji internet ([www.nibis.de](http://www.nibis.de))
- ji Bexçeyên zarokan û
- ji dibistanên sertayî

Belavkirin:

Wîzareta çandê ya Niedersachsen  
çapemenî û karê ragihandinê  
Schiffgraben 12  
30159 Hannover  
E-Mail : [pressestelle@mk.niedersachsen.de](mailto:pressestelle@mk.niedersachsen.de)

Qewetî ( Sipariş):

Fax: 0511/120 7450  
Email: [Bibliothek@mk.niedersachsen.de](mailto:Bibliothek@mk.niedersachsen.de)

Sipasiya me ji bo dê û bav û zarokên pola 1c ya dibistana sertayî li Lindener Markt Hannover, ji bo ku destûra me dan em van wêneyan biweşînin.

Berhevkiri:

[www.thomas-hey.de](http://www.thomas-hey.de)

Çap:

Druckerei Biewald, Hannover

Çile 2004

Piştgiriya ziman li dibistan  
û bexçeyên zarokan  
*kurdisch* kurmancî

## Dê û bav û baldêrên xweşewîst,

Ji bo ku mirov bikari be tevî jiyana civakî bibe zanîna zimanê almanî gelekî pêwîst e. Çiqasî ziman û pêşveçûna zimanê zarokan baş be hewqasî şansê serkeftina karê bi hev re, li dibistanê baş dibe. Ji bo vê yekê pêwîst e ku zaroka we zimanê zû hîn bibe û zani be.

### Destek û tedbîrên desthilatdariya herêmê ev in:

- Bi giştî hînbûna ziman wê li bexçeyê zarokan (Kindergarten) bê başkirin.
- Standîna zimanê almanî bi taybetî ji bo zarokên ji welatên din tîn wê di sala pêşî de û bi armanc xurt bibe. Bi vê yekê re tevîbûna dersê wê baş bibe.
- Di ser re destekên piştgiriya ziman, berî çûna dibistanê wê alîkariyê bi zaroka we re bikin, ji bo zanînen ziman yê ji bo dibistana sertyayî pêwîst in bistîne û bi pêş ve bibe.

Ev nivîs dihêle ku hun ditinekê li ser pêşkêşkirina piştgiriya ziman li bexçeyê zarokan, di niv sala dawî de berî çûna dibistanê û li dibistanê bistînin.

Ragihandinên fireh li ser piştgiriya ziman li bexçeyê zarokan û dibistanê hun dikarin di Internet de bibînin [www.fid.nibis.de](http://www.fid.nibis.de)

## Hun dikarin çî bikin?

- Rê vekin ku zaroka we sê salan biçê bexçeyê zarokan. Pêwîst e ku her roj biçê bexçeyê zarokan.
- Bi zimanê hun pir baş karin biaxivin, ev jî bi giştî zimanê dayîkê ye. Çiqasî zaroka we bi zimanê dayîka xwe bizani be hewqasî dikare zû û rehet hînî zimanên din bibe. Zimanê almanî jî bi zaroka xwe xweş bikin.
- Pêşkêşkirinan cidî bigirin ji bo hun zanîna zimanê xwe jî bi pêş ve bibin.
- Bi zaroka xwe re bistîrênin, bilîzin, bi hev re li pirtûkên wêneyan temaşe bikin, ji wê re bixwînin û ji hev re çîrokan bibêjin.

**Bi vê yekê hunê gelekî alîkariya zaroka xwe bikin ji bo ku ziman bi pêş ve here.**

### Piştgiriya ziman li bexçeyê zarokan

Zaroka we li bexçeyê zarokan hînî zimanê almanî jî dibe. Ev jî bo dibistanê, pişe (meslek) û jiyana bi hev re gelekî pêwîst e. Niha bexçeyê zarokan piştgiriya ziman xurtir dikin ji bo bêtir alîkariya zaroka we bikin. Di bexçeyê zarokan de yê gelek zarok ji welatên din hene, karmendên taybet di ser re vî karî dikin. Zaroka we xurtbûna xwe ya taybet di warê zimên de heye, ji bo vê yekê gerek e pêşkêşkirin li gora zarokê bin. Her weha derdora malbatî û kultûrî rolek mezin di hînkirina ziman de dilîzin, gerek e mirov vê yekê jî bide ber çavan.

**Mafê xwe yê qanûnî jî bo cihekî li bexçeyê zarokan bi kar bîne.**

## Piştgiriya ziman berî çûna dibistanê

Di dema qeydkirinê de, berî 10 mehan ji çûna dibistanê wê zaroka we di warê zanîna zimanê almanî de bê imtîhamkirin.

Ji bo vê rêyek mafdar û bi listikan ji bo zarokan heye, ka zanîna ziman bes e ji bo tevî rêza (sinifa) yekê bibin. Zarokên pêdiviya wan bi piştgiriyek perwerdeyîyê taybet di hêla ziman de hebe ji nav derdikevin.

Ji sibata 2004 wê kursên ziman ji bo zarokên ku zanîna wan di zimanê almanî de ne bes e bîn dan. Ev kurs yan li bexçeyên zarokan yan jî li dibistanê ji hêla mamosteyên dibistanê ve tîn dan û niv salê – heta çûna dibistanê dewam dikin. Yan berî nivro yan jî piştî nivro çêdibin. Dibistan, di wextê xwe de we agahdar dike.

Armanca piştgiriya ziman berî dibistanê ew e ku ji bo zaroka we riyek serkeftî di jiyana dibistanê de veke.

Eger zaroka we kari be di dibistanê de fam bike û bide famkirin wê derfet û karînen xwe hîn pêş de bibe û wê xweşî û serkeftinê di hînbûnê de bibîne û baştir bi zarokên din re bimeşe.

**Alîkariya zaroka xwe di van kursên ziman de bikin!**

Eger zimanê we ne almanî be, dibe ku ji we re balkêş be hun zimanê almanî hîn bibin û bi vê yekê bibin minak ji bo zaroka xwe.

Ev dan (her weha kursên tenê ji bo jinan), li Volkshochschule, Familienbildungsstätte, Stadtteilzentren ... hene. Ji kerema xwe sûd ji vê yekê bigirin!

**Zaroka we alîkariya we dixwaze!**